

RAPORA TESBÎTA REWŞA TUNDIYA LI JINAN A MÊR/DEWLETÊ YA LI KURDISTANÊ



SAL 2021 (ÇİLE-ÎLON)





NAVEROK

DESTPÊK 4

TUNDIYA MÊRAN 6

TUNDIYA BIUNÎFORMA 13

ENCAM 22



DESTPÊK

Jin bi tenê ne li dijî desthilatiya mêran, ji bilî wê li dijî şert û mercên faşîzmê û netewe-dewleta ku li ser esasên mêrperest avabûyî jî li ber xwe didin li Kurdistanê.

Tundiya li ser jinan encama diyardeya bi piştgiriya desthilatdarî û civaka mêrane pêk hatiye. Û dîroka wê jî xwe digihîne demeke pir dirêj. Ev diyardeya dîrokî ji aliyê hemû îdeolojiyên ku dixwazin desthilatdar bin bi şertê sabîtgiirtina têkiliya newekheviyê, îdeolojiyên serdema xwe ji nû ve ava kirine. Tundiya li ser jinan yek ji argûmantên sereke yê îdeolojiyan bûye.

Di pêvajoya civakî de diyardeya tundiyê ku bi hêza piştgiriya desthilatî û bi hukimdariya karbidestî, hewl daye ku laş, îrade, fikr û hestên jinan bike bin çavderiya xwe, û îdeolojiya desthilatdar, serboriya xwe ya dîrokî li ser vê mekanîzmayê ava kiriye. Tundiya mêran a binyadî bûye şaxekî modernîteya kapîtalîst e û vê jî di vê pêvajoya ku em tê de ne û bi kontakta prototîpa serdestî-bindestî xwe saz kiriye.

Li Kurdistanê, li Rojhilata Navîn, li Tirkiyeyê û li hemû dinyayê tundiya li ser jinan bi

her cureyê û bi heman binyadê tê jiyîn. Ev krîza ku modernîteya kapîtalîst tevê endîşeya nîjadî ya netew dewletan jî tundiyê dike, îro gihîştîye asteke pir berz. Xelasiya ji vê krîzê jî bi rêjeyeke hêzdar êrişkirina destketî û hebûna jinan e. Wekî vegotina gelek jinan hewla bi fikr û rihê miqtedîr, alim, dozger û afirîneran pergala wek "nêçîra cadûyan" dixebite. Nîşaneyên sereke ya vê xebatê jî êrişkirina destketiyên jinan e.

Tundiya mêran a ku li ser erdnîgariya me pêk tê ji rewşa heyî ya cîhanê cuda nîne. Bloga MHP û AKPYê ji roja ewil a serdestiya xwe de diyar kiriye ku ew ê îradeya jinan bi awayekî paşverû bibînin û ew ê hew jina maqûl binasin û di hemû karên xwe de jî hewla vê pêkhatinê kiriye. Di hemû pêvajoyan de ku wan ji bo desthilata xwe wek metirsî dîtiye, pêşî berê xwe daye destketiyên jinan û tundiya li ser jinan wek rêbaza xelasiyê nîşan daye, îro ev rê û rêbaz wek parçeyekî qirkirina jinan tê dîtin. Tevî OHALê girtina gelek saziyên jinan, binçavkirin û girtina çalakvanên jin, bi KHK'yê ji kar dûrxistina jinan, bi rêya qeyûman têkbirina rêvebirîya xwecihî ya azadîxwaza jinan, krîmînîlazekirina pergala hevserokiyê, feshkirina Peymana Stenbolê çendîn mînakên vê polîtîkaya tundrew a wan in. Ew biryarên ku bandora xwe li ser hemû jinên vê erdnîgariyê dikin, dîsa di hemû polîtîkayên din de û bi taybetî jî di pêvajoya şer û tecrîdê de, li ser Kurdistanê bandereke cudatir û kûrtir pêk anî û ev bandor hîn jî didome.

Ev polîtîkaya taybet ku bûye sedema sereke ya nivîsîna vê raporê, bi kûrbûna pîrsgirêka Kurdistanê re bûye encama kirinên wan. Bi awayekî israrker polîtîkayên ewlehî û şerê zordarî plana têkbirinê di nav civakê de jî bi rê ve dibe. Bi têkbirina civakê li pey avakirina gelekî ne ku demarên wê yê polîtîk hatiye tunekirin û bêyî çand û nasnameya xwe diji. Bi tecrîda bêdawî ya li Girava Îmraliyê gef li demara berxwedanê ya ewil a li girtîgehên û piştî jî li civakê tê xwarin. Bêdadiya awarte ya li Girava Îmraliyê wek 'rewşa îstîsnaî' bi rê ve diçe, îro li ser hemû civakê jî wek kevneşopîya 'îstîsnaî' ya dewletê bûye paldanka bêcezatiyan. Mîlîtarîzma ku ji desthilatdariya mêran hêzê digire bi erka bêcezatiyê dibe hiceta mertala cot tundiyê. Ev tundiya ku li ser jinan pêk tê di nav vê mertalê de şeweya xwe digire. Jin ne tenê li hemberî desthilatdariya mêran li hemberî faşîzma ku halê wê yê herî birêxistî netew-dewlet e û şaxên ku xwe dispêrên wê jî li ber xwe didin.

Wekî ku raya giştî jî baş dizane civaka kurdan bi berxwedanên dijwar polîtîkayên giring a wekheviya jinan bi rê ve biriye û bi pêşengiya jinan gavên pir giring di guherîna civakê de avêtiye. Îro ev destketî rasterast tê hedefgirtin û dixwazin hêza pêşengên vê berxwedanê tune bikin. Bi berxwedanê derxistina karektera civakî ya wekhev ji bo nêrîta mêrane dixwazin tune bikin.

Bi rêvebirina polîtîkaya xwe ya giştî ji rêvebirîya xwecihî heta hemû rêvebirîya îdarî, ji çandê heta perwerdeyê, ji dîn heta avakirina komên mîlîtarîst hemû amûrên îdeolojîk bi kar tîne. Dixwazin paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinan tune bikin. Bêguman çawa ku ev êriş şeweya pêvajoya dîrokî ye, bi heman awayî mîrateya berxwedanê û serhildanê jî hînî me kiriye. Berxwedana jinên Kurd a li hemberî desthilatdariya mêran bê navber didome. Ev xebata me jî encama çanda berxwedanê ye û xwe dispêre wê ked û bawerîya jinên ku di vê çanda berxwedanê da kemilî ne, û xwe dispêre Denîz Poyrazê û wan jinên ku bi destê dewleta mêr hatine qetilkirin.



TUNDIYA MÊRAN



Tundiya mêran ne tesedifî lê bi awayekî
sîstematîk tê pêkanîn. Mêrê ku tundiyê dike
hem ne anormal e û hem jî bingeha vê
reftarê ne patolojîk e.

Desthilatdariya meran, hevkarîya di navbera jin û mêrê bi rêya tundiyê normalîze û sazûmanî kiriye. Ji ber vê "tundiya li ser jine" bûye mijara sereke ya têkoşîna jinê. Tundiya li ser jinê tundiya bi pergal e ku him di hundir û derveyê malê û him jî hemû taxên jiyanê tê kirin.

Yek ji taybetiyekê berbiçav a tundiya mêran ev e jinên ku rastî vê tundiyê tên bi deme ra vê tundiyê normalîze dikin û ji bo qebûlkirina vê yekê jî stratejiyan diafirînin. Gelek caran jin sedema tundiyê di xwe da an jî li cihekê din digerin. Lêbelê tundiya mêran ne rasthatî ye beravajî vê bi pergalî tê avakirin. Mêre ku bere xwe dide tundiyê ne normal e lê tevê vê tevgerê patolojîk jî nîşan nade.

Tundiya mêran amûra awayê kontrolkirina desthilatdariya pergala nêrane ye. Di berxwedana li dijî tundiya mêran de ji bo jî nû ve avakirina normên civakî sazkirina hêmanên dadî, komeleyatî, siyasî û aborî giring in. Ji ber vê jî berxwedana ku jin bi rê ve dibin ji bo avakirina wekhevkirina zayendiya civakî israrkar bûye.

ÊRÎŞÊN LI DIJÎ DESTKEFTIYÊN JINAN Û POLÎTİKAYÊN BÊCEZATIYÊ

Yek ji serkeftina berxwedana jinan Peymana Stenbolê ye ku tundiya mêran bi perspektîfa zayenda civakî dinirxîne û bi wî awayî jî Peymanê kir ku nêrîta desthilatdariya mêrane ya dewletên alîgir bê guhertin. Peymana Rêlibergirtin û Têkoşîna Tundiya li Jinan û Tundiya Hundurê Malê ya Konseya Ewropayê, ku wek Peymana Stenbolê tê zanîn, bi berfirehî li dijî tundiya mêran disekine û Tîrkiye alîgir û îmzakarê ewil ê vê Peymanê ye.

Lê belê di 20 Adara 2021ê de li Tîrkiyeyê ku êdî tundiya li ser jinan û encama vê tundiyê kuştina jinan bûye pîrsgirêkeke sereke, biryara vekîşîna peymanê hat girtin.

Vekîşîna peymanê navnetewî ku bi awayekî hiqûqî mafê jinan diparêze û armanca wê jinan ji tundiyê xelas bike, li dijî makezagonê ye. Ev li aliyekî; dewletê bi vê biryara xwe ya vekîşînê, erka xwe red kir ku divê li dijî tundiyê parastina jinan bike, rê li ber tundiyê bigire û faîlan ceza bike.

Sekna desthilatdarî tundiya mêran xwedî dike, bi êrîşkirina destketiyên jinan û bi polîtîkayên xwe yên bêcezatiyê jî xwedîkirina xwe diyar kiriye û vê yekê jî didomîne. Ev rapora ku hêmanên tundiya li ser jinan di xwe de di hewîne bi armanca eşkerekirina tundiya mêran a li Kurdistanê hatiye amadekirin. Rapor li ser xebatên herêmî, çavkaniyên xwecihî, serlêdanên jinên li partiyên siyasî, rêxistinên jinan, rêxistinên mafparêzan, baro û sendikayan dane kom kirine.

Me ji bo hêmanên ku hatine tomarkirin 2 rê şopandine; me jinên ku li bajarên diyarkirî dijîn serî li rêxistinên xwecihî dane tomar kirin, a duyem jî me daneyên jinên li bajarên Kurdistanê rastî tundiyê hatine ji çapemeniyê wergirtin.

Dema ku rapor dihat amadekirin hêmanên ku me tespît kirine ev in:

- Rêxistinên ku vê xebatê bi rê ve dibin taybetî jî rêxistinên xwecihî daneyên tundiya li ser jinan nenivîsîne
 - Saziyên ku dane qeyd kirine jî bi rêbazeke kêr/teng girtine.
 - Rêxistinên tevlihev serlêdanên jinan di raporekê taybet de kom nekirine, berevajî di nav raporên giştî de nivîsîne.
 - Saziyên civakî cih nedane hejmara jinên ku rastî tundiye hatine û bo vê yekê serî li wan dane.
-

Li gor çarçoveya rêbaza diyarkirî bi rêya rêxistinên hewla tomarkirina hemû daneyan hat dayîn. Armanca ne "bi hejmareke zêde" tomarkirina daneyên tundiye ye, berevajî vê, bi her awa û şewayî eşkerekirina tundiya mêran e.


Armanca vê xebatê ew e ku tundiya mêran bi awayekî hejmarî wek encama hêmaneke binyadî ku bi piştgiriya desthilatdariya mêrane pêk tê nîşan bide.

Di naveroka raporê de diyar dibe ku tu saziyek tune ku serbixwe li ser jinan dixebite. Ji ber ku saziyên girêdayî rêveberiya xwecihî bûne ji aliye qeyûman ve hatiye girtin. Bo vê jî ji saziyên giştî, sendika û partiyên siyasî dane hatine xwestin. Sedema mezin a sînordarbûna vê xebatê ew e ku saziyên taybetî li ser vê mijarê bixebitin û polîtîkayan biafirînin tunene.

Li gor vê rapora ku bi 9 mehên ewil a 2021ê sînordar e li Kurdistanê ji ber tundiya mêran 64 jin jiyana xwe ji dest dane. Ji wan 17 heb kujerên wan diyar in, lê 47 heb jî bi awayekî gumanbar hatine kuştin. 321 jin ji aliyê otorîteyekê ku di jiyana wê de ye (bav, bira, hevjin, destgirtî, merivê wê an jî merekî nenas) rastî tundiye hatine.

Her çiqas jin bi serlêdanên tundiya fizîkî, derûnî, aborî, civakî, dijîtal an jî şopandina bi israri biçin saziyan jî, diyar dibe ku di encamê de hemû tundî hevûdin xwedî dikin. 9 jin diyar dikin ku hatine tecawizkirin û 12 jin jî hatine tacizkirin.

Jinên ku bo tundiya mêran serî li saziyên xwecihî didin diyar dikin ku bi awayekî sistematîk rastî tundiye tên. Lê ji ber ku ji gumana cezane girtina mêrên tundrew û zêdebûna tundiya li wê tê kirin newêrin giliya mêrê tundrew bikin. Dîsa li gorî agahiyên saziyên xwecihî, jinên ku rastî taciz û tecawizê tên ji sedema bandorê û cezane girtina failan ji bilî wan jî ji tohmetiya civakê nikarin gilî bikin û vê tundiye vedişêrin.



Daneyên ku ji çapemeniyê hatine wergirtin¹ jî xwe dispêrên rojnameyên xwecihî û netewî. Li gor daneyên ku ji çapemeniyê hatine tomarkirin;

Li Kurdistanê² 59 jin ji ber tundiya mêrên ku jiyana wan de ne jiyana xwe ji dest dane. Ji wan 37 jin bi awayekî gumanbar, 22 jin jî ji aliyê mêrên ku di jiyana wan de ne hatine kuştin. 15 jin bi zorê fihûş kirine, 8 jin hatine tecawizkirin, 4 jin jî hatine tacîzkirin. Ew dane tenê ji serlêdanên jinan ên li saziyekê pêk tê.

1 Daneyên ku di Bianet û Jinnews'ê de dihevine.

2 Di beşa raporê de bajarên ku me dane kom kirine ev in: Semsûr, Agirî, Amed, Batman, Çewlîg, Bidlîs, Dêrsim, Elezîz, Erzorom, Colemêrg, Îdir, Qers, Meletî, Mêrdîn, Sêrt, Şirnex, Riha, Wan

	Qetla Jinan	Tecawiz/Êrişa Cinsî	Mirina Gumanbar	Fihûşa Bi Darê Zorê	Tundî	Tacîz	Tundiya Biunîforma
Semsûr					3		
Agirî	1				1		
Amed	7		7		5	1	
Batman		1	1	6	1		
Çewlig	1						1
Bidlîs			1				
Dêrsîm		2	1		2		
Elezîz	2				1		
Erzorum		1			1		
Colemêrg		1					1
Îdir	1						
Qers			1		3		
Meletî	2		2			1	
Mêrdîn	4	1	5		5		
Sêrt		1	5				
Şirnex		1	2		1		1
Riha	3	1	7		3	2	
Wan	2		3	6	4		
	22	9	36	12	30	4	3

Em dizanin, ev daneyên ku gihîştine destê me tenê qismek ji daneyên rastiyê ne. Di nav van daneyan de ku me tomar kirine herî berbiçav xwekuştina jinan a ji ber tundîya mêran e. Jin li ser navê xwekuştinê tên qetilkirin.

Bi têkoşîna rêxistina jinan ev rewş diyar dibe û bicezanegirtina faîlan encam dide. Lê belê mixabin gelek caran dadgeh xwe ji parastina faîlan dûr nagire û alîgiriya faîlan dike.

Wekî ku me li destpêkê jî diyar kir armanca me ne eşkerekirina hejmarekê ye, berevajî vê em dixwazin bi her awa û şewazî tundiyê li ber çavan raxînin. Û dîsa hewla me bo xwedîkirina desthilatdarî tundîya biunîforma eşkere bikin ku ew rêbazekî şerê taybet e.

Li derên ku şer û pevçûn lê heye bi qasî mirinê tundîya li jinan û politikayên taybet ên şer jî rastiyêke din e ku derdikeve pêş. Tacîz, tecawiz, tundî, revandina jinan, veqetandina keçikan ji malbatên wan wek rêbazeke pir kevn ên şer îro hîna jî dewam dikin.



TUNDIYA BIUNÎFORMA

Ji salên 90'an heta niha, di nav şert û mercên şer de, li dijî jinan gelek êrişên zayendî hatin pêkanîn, lê failên wan êrişan nehatin cezakirin, ew kes hîn jî li ser kar in.

Li derên ku şer û pevçûn lê heye bi qasî mirinê tundiya li jinan û politikayên taybet ên şer jî rastiyeke din e ku derdikeve pêş. Tacîz, tecawiz, tundî, revandina jinan, veqetandina keçikan ji malbatên wan wek rêbazeke pir kevn ên şer îro hîna jî dewam dikin.

Li Kurdistanê hikûmet bên guherandin jî "rêbaza qedîm a şerî" nehatiye guhertin, bi rê û rêbazên cuda hatiye dewamkirin. Ji salên 90î heta vir ve li gelek jinan êrişên cinsî hatin pêkanîn û sûcdarên van êrişan nehatin cezakirin, van sûcdaran peywirên xwe domandin. Buroya Alîkariya Hiqûqî ya li Dijî Tacîz û Tacewiza di bin çavan de her sal derheqê êrişên cinsî yê ku di bin çavan de li jinan tên kirin statistîkan diweşîne. Li gor Buroyê ji sala 1997an heta 2020î 105 jin rastî tacîza cinsî, 544 jin jî rastî êrişa cinsî hatine. Li gor daneyan 4 jinên ku rastî tecawizê hatine întixar kirine, jinek bi şkençeyê hatiye kuştin, keçikeke 14 salî piştî ku rastî tecawizê hatiye ji aliyê xizmên xwe ve hatiye kuştin, jinek ji ber encamên şkençeyê di Berfanbara sala 1999an de jiyana xwe ji dest daye. Li gor daneyên bêqeyd 24 jin di bin çavan de rastî tacîz û tecawizê hatine, jinek bi rêya çapemeniyê rastî tacîza cinsî hatiye. 11 jinan ji ber şkençeyê ber avêtine. 17 jin bi zarokên xwe yê 3,5-10 salî re rastî şkençeyê hatine, 7 jin piştî tecawizê avis mane, 5 jin bi darê zorê mecbûrî kontrola bekaretê bûne. Li gor van daneyan ji sûcdaran 389 kes polîs, 125 kes cendirme û leşker, 33 kes tîma taybet, 22 kes cerdevan û 66 kes jî karmendên parastinê ne.

Di sala 2020î de 75 jinan serî li Buroyê dane û 45 ji van jinan Kurd bûn. Li gor van 45 jinên Kurd sûcdar ev kes bûn;

Polîs	: 49
Cendirme/Leşker	: 15
Tîma Taybet	: 3
Cerdevan	: 1
Gardiyar	: 19
Nobedar	: 1
Peywirdarên din ên Kamûyê	: 30
DAIŞ	: 1

Bêguman ev dane li gor hemû bûyerên ku çêbûne kêman in. Bi hezaran jin hene ku rastî van êrişan hatine lê belê nikarin dengê xwe bikin. Ev dane wek tundiya dewletê hew di nezaretan de qewimîne.

Di bin vê êrişê şerî ku serdestiya mêran li ser jinan ferz dike, daxwaza zeftkirinê heye û motîvasiyona xwe ji politikayên bêcezatiyê distîne. Ji ber ku ji salên goî heta vir ve tu sûcdarê biunîforma ji ber sûcên xwe ceza nestendine.

REWŞA BÊCEZATIYÊ YA FAILÊN TUNDIYA KESÊN BIÛNIFORMA

Ev politikayên bêcezatiyê ku ji mêj ve ne li Kurdistanê li dar in, hîn jî berdewam dikin. Mînakê herî berbiçav Îpek Er e ku ji ber tecawiza Musa Orhan xwe kuşt lê belê Musa Orhan nehat girtin. Digel negirtina wî, derheqê hin kesan de ku wan Musa Orhan şermezar kir, doz hatin vekirin, cezayên pereyan li wan hatin dayîn. Bi vê bêcezatiyê xwestin sûcê Musa Orhan bigirin û ji gel xwestin ku di bûyerên bi vî awayî de xwe ker bikin.

Ev feraseta mêr-dewletê hemû derfetên modernîteya kapîtalîst bi kar tîne û dixwaze tundiya biunîforma meşrû bike. Ev feraseta ku bi piştevaniya darazê li kar e, dixwaze li Kurdistanê jinan ji têkoşînê dûr bixe, wan bêirade bike û wan tenê bihêle.

Tundiya biunîforma ya ku ji hêla civakê ve tê zanîn û em jî ji wan agahdar in ev in;

- Tê zanîn ku leşker, polîs, nobedar û cerdevan li ber dibistanan wek sivîlan disekin û dixwazin bi jinên ciwan re têkiliyan deynin.
- Ev kesên biunîforma hewl didin ku jinên ciwan bi sozên wek "evîn, zewac"ê bixapînin.
- Ev kesên biunîforma torên civakî yê jinên ciwan dişopînin. Dema ku jinên ciwan naxwazin bi van kesan re bipeyivin jî ev kesên biunîforma gefê li wan dixwin.
- Ev kesên biunîforma wêneyên têkiliya zayendî digirin û dîsa gefê li jinan dixwin.
- Ev kesên biunîforma bi wêneyên axaftinan jinan dixin tora fihûşê.
- Jinên ku ji van kesên biunîforma re dibêjin em ê giliyê we bikin, ji aliyê wan kesan ve bi wêneyên peyama û axaftinan tîndîr tehdîtîkirin, ev kesên biunîforma bûyera Musa Orhan tîndîr bîra jinan û jin neçar dimînin û giliyê wan nakin.

- Dema ku jinên ciwan naçin mala xwe yan jî dema ku tèn revandin malbat diçe serî li qereqolan dide lê belê li qereqolê polîs ji malbatana re dibêjin "herin mala xwe, ew ê vegere". Bi vî awayî giliyên malbatan nayên qeydkirin, mêrên ku jinan direvinîn nayên cezakirin û pere didin malbata keçikan û bi keçikan re dizewicin.

- Sektora fihûşê bi navê "Xaniyên bi kirê bo rojekê" ev salên dawiyê tê teşwîqkirin. Li her derê Kurdistanê ev xanî hene û îlana wan li her derê ye. Ev xanî bi zanebûn nayên kontrolkirin.

- Kesên biunîforma li kafe, park û rawestgehan kaxizên ku nimreyên telefonan li ser in didin jinên ciwan.

- Kesên ku madeyên hişbir difiroşin tèn zanîn lê belê nayên astengkirin. Ev kes li ber dibistanan madeyan difiroşin ciwanan.

- Jinên ku di nava têkoşînê de ne ji aliyê hevjinên xwe, zarokên xwe, xizmên xwe û ciranên xwe ve tèn krîmînalîzekirin.

- Dema ku sûcdar yekî biunîforma be jin ditirsin gilî bikin. Ji ber ku dizanin ew ê ji qereqolan bèn derxistin û giliyên wan dê neyên qeydkirin, lewma bêdeng dimînin.

Pratîkên wisa li ser axa me dewam dikin. Digel sûcên ku eşkere tèn kîrin, dixwazin nixên gelê Kurd birizînin û vê yekê jî di ser jinan re û di ser zarokan re çêdikin. Jin ji ber ku beşdarî çalakiyên 8ê Adarê, 25ê Mijdarê bûne tèn darizandin û bi rêya darazê jî tèn tacîzkirin lê belê ev kesên biunîforma yên sûcdar ne ceza distînin û ne jî tèn darizandin. Bûyerên bi vî rengî êdî pir zêde ne.

Çend mînak;

- Li Çelêya Colemêrgê çeteya fihûşê ku cerdevan û çawişên pîspor jî tê de ne, hebên hişbir dan jinan û piştî ku jin ji ser hişê xwe ve çûne dîmenên tazî yên jinan girtin û bi van dîmenan jin xistin tora fihûşê.³

- Li taxa Ulubağ a Çewligê jineke bi navê Merve A. (18) li malekê bi awayekî gumanbar mir ku ew mal wek rojane dihat kirêkirin. Wek întixar kiriye hatibe nîşandan jî Merveyê wê rojê telefonî meta xwe kiriye û jê re gotiye ew ê bi çawişekî pîspor re bireve û dê bi hev re biçin Manîsayê. Dûre malbat telefonî polîsan kiriye û gotine keça me wenda bûye lê belê polîsan dûre tu agahî nedane malbatê.

³ <https://artigercek.com/haberler/cukurca-ve-hakkari-de-fuhus-ve-santaj-cetesi-iddiasi-savcilik-sorusturma-baslatti>

● Aslan Karakaşê (34) cerdevan li Bismila Amedê 4ê Sibata 2021ê de xizma xwe Emine Karakaşa 17 salî ji ber ku nexwest pê re bizewice kuşt. Emine Karakaş 23ê Hezîranê jiyana xwe ji dest da. Li mala sûcdarî gelek çek hatin zeftkirin, lê belê hew îfadeya malbatê hat stendin û tev hatin berdan. Aslan Karakaş piştî qetlê bi du mehan îfadeya xwe da û hat berdan.

● Li Gêla Amedê sercerdevan û îtirafkerê berê ê MÎTê Murat İpekî, Aleyna Avciya 21 salî bi awayekî giran birîndar kir.

● Enes G.yê ku li Miduriyeta Parastinê ya Colemêrgê dixebite, tecawizî karmendekê din a beşeke din a Miduriyetê G.A.Û.yê kir. Sûcdar nehat cezakirin û bi jinê re zewicî û sûc hat tepisandin.

● Li Stewra Mêrdînê cerdevanên bi navê H.B. û R.Ç. tecawizî jienkê kir û piştî giliyê jinê her du cerdevan hatin binçavkirin. Piştî stendina îfadeyan bi daxwaza dozgeriyê cerdevan hatin berdan.

● 11ê Tîrmehê li Kanîreşa Çewligê Kader Y. Li gundê xwe Keranê yê ku ji bo betlaneyê çûbûyê bi awayekî gumanbar jiyana xwe ji dest da. Kader Y. ya ku bi hevjin û zarokên xwe re li Stenbolê dijiya ji bo betlaneyê çûbû gundê xwe. Hat îdiakirin ku wê li gundê xwe bi çeka cerdevanekî xwe kuştîye.

● Zeynep Sevim li Hezoya Batmanê ji aliyê hevjin û birayê xwe yê çawişê pispore ve rastî şkençe û gefan hat. Çawişê pispore bi ser mala Zeynepê de girt û bi gotinên "em hatin vir xwînê birjînin, dewlet em in" gef lê xwarin. Digel van gefan û şkençeyan her du mêr jî hatin berdan.

● 20ê Gulana 2021ê li Dêrsimê du çawişên pispore bi çek gef li Fidan Yıldırımê xwar. Piştî berteka gel wan Fidan berda, vepirsîn hat vekirin lê belê derheqê wan de tu ceza nehat dayîn.

● 3ê Tebaxa 2021ê li Dêrsimê di kargeheke bihewiz de leşkerekî zarokeke 16 salî tacîz kir lê belê tu ceza nehat dayîn.

● Li Pîrana Amedê mamosteyekî zarokeke 15 salî îstismar kir. Şaredarê Pîranê, Gerinendeyê Perwerdeyê yê Pîranê û Dozderî ji bo malbat giliyên xwe vekişînin zef li malbatê kir.

Derbarê sûcdarên biunîforma de hiqûq nehatiye şixulandin. Gelek sûcên ku di makezagonê de wek sûc hatine nîşandan û xwedî berdêlên cezaî ne, ji bo kesên biunîforma hatine dewisandin. Digel ku sûcên wan hatine peyitandin jî wna tu ceza nestendine.

Lê belê jinên ku li dijî van sûcan dengê xwe radikin, têkoşîna jinan dimeşînin bi awayekî pergalî hatin binçavkirin, hatin girtin û cezayên pir zêde li wan hatin dayîn. Di nava sala 2021ê de;

- 1-** 1. Ji bo Hevseroka Rezanê ya HDP'ê Arzu Karaman bi îdiaya "endamiya rêxistinê" 9 sal ceza hat dayîn.
- 2-** 2. Ji bo Hevberdevka Komîsyona Rêxistina Navendî ya HDP'ê Özlem Gündüz ji ber axaftinên wê yên wek "bila jin neyên qetlîkirin", "bila jin di qada demokratîk de siyasetê bikin" 6 sal ceza hat dayîn.
- 3-** Ji bo Hevşaredara Sûrê Filiz Buluttekin bi îdiaya "endamiya rêxistinê" 7 sal û 6 meh ceza hat dayîn.
- 4-** Ji bo Endama Dîwanê ya KCD'ê Jiyan Taşê, bi îdiaya "endamiya rêxistinê" 6 sal û 3 meh ceza hat dayîn.
- 5-** Hevşaredara Bajarokê Kaniya Hênê ya Batmanê Gülistan Sönük û encumena navçeya Hezoyê Şükran Çotak jî tê de 8 kes 14ê Sibata 2021ê hatin binçavkirin.
- 6-** Hevseroka Qersê Sevda Subaşı jî tê de 3 rêvebirên HDP'ê 12ê Sibata hatin binçavkirin û 3 jî wan hatin girtin.
- 7-** Meryem Soyluya 79 salî û dayika aştiyê Hatun Aslana 71 salî jî tê de 14 kes 27ê Sibata hatin binçavkirin.
- 8-** Bêrîvan Ado li Qosera Mêrdînê 27ê Sibata ji aliyê cendirmeyan ve hat binçavkirin.
- 9-** Li Mêrdînê ji bo ku beşdarî çalakiyên 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya li Jinan a Navneteweyî bûne 3 hezar û 150 TL cezayê pereyî li jinan hat birîn.
- 10-** Parlamentera berê a HDP'ê ya Sêrtê Hatice Kocaman bi hinceta "endamiya rêxistinê" li Amedê hat girtin.
- 11-** Di 23ê Çileyê 2021ê de Perihan Karaman li Taxa Alipaşayê hat girtin.
- 12-** Li Amedê ji bo Şükran Akboğa (59) digel ku xwendin û nivîsîna wê nîne bi hinceta ku wê di hesabên xwe yên tora civakî de wêneyê Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan parve kiriye doz hat vekirin.
- 13-** Derheqê Berdevka TJA'yê Ayşe Gökkan de bi hinceta "endamî û rêveberiya rêxistinê" doz hat vekirin û biryara girtina wê hat dayîn.
- 14-** Ji bo Hevseroka Sûrê ya HDP'ê Hatun Yıldızê, 6 sal û 3 meh ceza hat dayîn.

15- Ji bo Hevşaredara Gimgimê Ülkü Karaaslanê ku li şûna wê qeyûm hat tayînkirin, 2 sal û 3 meh ceza hat dayîn.

16- Ji bo aktîvîsta TJA'yê Gülcihan Şimşek 5 sal ceza hatibû dayîn. Dûre dadgehê ev ceza zêde kir û kir 7 sal û 6 meh. Dadgehê derbarê Şimşekê de got "meyla wê li sûckirinê heye".

17- Aktîvîsta TJA'yê Bêrîtan Önen, li mala xwe ya Amedê hat binçavkirin û dûre hat girtin.

18- Ji bo Endama Partiyê ya HDPê Halide Türkoğluyê, bi hincetên ku endama KJA'yê û KURDÎ-DERê bû 6 sal û 3 meh ceza hat dayîn.

19- Ji bo Hevseroka Amedê ya HDP'ê Hülya Alökmen Uyanîkê, bi hinceta "endamiya rêxistinê" 6 sal û 3 meh ceza hat dayîn.

20- 26 jin li Amedê hatin binçavkirin, 11 kes ji wan hatin girtin.

21- Li Mêrdînê û navçeyên wê Meles Gültekina 72 salî jî tê de 7 kes hatin binçavkirin.

22- 19ê Gulanê li Wanê Hevseroka MEBYA-DER'ê Gülistan Önver jî tê de 15 kes hatin binçavkirin. 6 ji wan hatin girtin.

23- Ji bo dayika aştiyê Fatma Turanê bi hinceta ku ew "bi awayekî eşkere gel ji bo kîn û nefretê tehrîk dike û pesnê sûc û sûcdaran dide" 10 meh û 25 roj ceza hat dayîn.

24- Dilşa Kocakaya 8ê Hezîranê li Amedê ji mala xwe hat binçavkirin.

25- 11ê Hezîranê li Colemêrgê û navçeya wê Şemzînanê, Hevseroka berê a Colemêrgê ya HDPê Sipan Turan, Hevseroka navçeyê Sinem Seven, Berdevka Meclisa Jinan Zeynep Kaya û Hevseroka Şemzînanê Sozdar Atilla hatin binçavkirin.

26- 6ê Tîrmehê li Mêrdînê û navçeyên wê dayikên aştiyê jî tê de 29 kes hatin binçavkirin, 2 jin ji wan hatin girtin.

27- 12ê Tîrmehê li taxa Karşiyakaya girêdayî Navçeya Rêya Armûşê ya Wanê Meral Abi serê sibehê zû ji aliyê cendirmeyan ve hat binçavkirin.

28- 16ê Tîrmehê Hevseroka navçeya Tuşpayê Hanım Akkuş hat binçavkirin.

29- Ji bo Hevşaredara Gêlê Gülistan Ensarioğluyê ya ku li şûna wê qeyûm hat tayînkirin 6 sal û 3 meh ceza hat dayîn.

30- Ji bo Hevseroka berê ya navçeya Midyadê Filiz Işıkê 6 sal, 10 meh û 25 roj ceza hat dayîn.

31- 11ê Tebaxa 2021ê Hevseroka Mûşê ya HDP'ê Belma Nergiz hat binçavkirin û dûre hat girtin.

32- 19ê Tebaxa 2021ê li gundê Dêlezî yê girêdayî Colemêrgê Rêvebirê Rêxistina Bajêr Evliya Alkan jî tê de 6 kes ji aliyê cendirmeyan ve hatin binçavkirin.

33- 24ê Tebaxa 2021ê li Eyyubiyeya girêdayî Rihayê Melek Başkale hat binçavkirin û dûre hat girtin.

34- Mûhabîra Jinnewsê Beritan Canözer, ji mala xwe hat binçavkirin.

35- Li Colemêrgê derbarê 4 jinan de bi hinceta ku li dijî tundiya li jinan têkoşiyane ji hêla Serdozgeriya Colemêrgê ve doz hat vekirin. Di îdianameyê de daxuyaniya çapemeniyê ya ku Rêxistina Bajarê Colemêrgê ya HDPê di 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya li Jinan a Navneteweyî de dane wek "dûc" hat qeydkirin.

36- 18ê Adarê aktîvîsta TJA'yê Hediye Yayık û Endama Meclisa Ciwanan a Partiyê ya HDPê Berfin Can dema ku ji avahiya HDPê ya Cizîrê derdiketin ji hêla polîsan ve hatin binçavkirin.

37- 16ê Tîrmehê li taxa Turgut Özal a Hezexê ya navçeya Şirnexê polîsan bi copan li piştê Hatice Baykarayê (28) xistin û ew derb kirin ku ew avisa 8 mehî bû.

38- Ji bo aktîvîsta TJA'yê Zelal Bilgin bi hinceta xebatên wê yên ji bo jinan 9 sal ceza hat dayîn.

39- Ji bo Berdevka TJA'yê Ayşe Gökkanê bi hinceta xebatên wê yên ji bo jinan 30 sal ceza hat dayîn.

Mêrên ku li dijî jinan sûc kirin bi zirxê bêcezatiyê hatin parastin lê belê jinên ku ji bo xebatên jinan têkoşiyar, daxuyanî dan her tim rastî tacîzê hatin. Xebatên ku li dijî tundiya li jinan li Kurdistanê pêk dihatin ji hêla çapemeniyê ve wek sûc hatin nîşandan. Li Mêrdînê û Colemêrgê li jinên ku ji bo 25ê Mijdarê Roja Têkoşîna Li Dijî Tundiya li Jinan a Navneteweyî daxuyanî dan cezayê pereyî hat dayîn, derbarê wan jinan de doz hat vekirin.

ENCAM

Desthilatiya siyasî, li bajarên Kurdistanê di serî de li dijî jinên ciwan û hemû jinan tawanên şer pêk tîne, ew kesên ku van tawanan dikin rasterast tên teşwîqkirin û bi tu awayî nayên cezakirin.

Zihniyeta serdestiya mêran a ku ji destpêka dîrokê ve hatiye avakirin hîn jî jinan qetl dike û wan ji jiyane qut dike. Ev qetlêkirin hew ne fizîkî ye, fikrî û derûnî ye jî. Bi qasî ku jin wek fizîkî di bin talûkeyê de ne, ji nasnameya xwe, ji çanda xwe, ji tercihên xwe yê polîtîk jî tên cezakirin û jin tune tên hesibandin. Jinên ku li dijî van polîtîkayan serî hildidin, têdikoşin, bi destê dewletê û bi rêya darazê tên tacîzkirin. Hemû polîtîkayên qirêj berê xwe dane jinan. Şert û mercên tecrîda giran ji bo bêhiqûqiyê û bêcezatiyê meşrû bike wek alav tê bikaranîn. Her tiştê derbarê Kurdistanê û jinên Kurdan de wek teror tê nîşandan û bi vê yekê re jî hewl didin sûcên xwe bidewisîn.

Tundiya mêran a ku li Kurdistanê tê kirin li ser du hêlan diqewime. Ji hêlekê ve ji aliyê mêran ve tê kirin û bi destê siyasetê tê xurtkirin, ji hêla din ve tundî bi netew-dewletê tê pêkanîn. Hikûmeta heyî li bajarên Kurdistanê di serî de jinên ciwan li hember hemû jinan sûcên şerî pêk tîne, failên ku van sûcan dikin teşwîq dike û tu ceza nade failan. Jin ji aliyê kesên biuniforma ve bi taybetî bi rêya medyayê tên xapandin, bi sozên wek "evîn û zewac"ê berê xwe dane laşên jinan, keda jinan û nasnameya jinan. Ev rewşa hanê hatiye wê astê ku êdî haya her kesî pê heye û êdî hemû civak bi van polîtîkayan dizane. Ev polîtîkayên qirêj her roj zêdetir û berbelavtir dibin. Lê belê ji bo rêlibergirtina van kiryanan tu xebat nayê kirin û gavek nayê avêtin. Jinên ku vê rewşê teşhîr dikin ji hêla hêza mîrperest ve tên dewisandin û bêdengxistin.

Em vê feraseta mîr-dewletê ya ku tehemûlî jinên şoreşger û birêxistî nake ji dîrokê nas dikin û em bi vê ferasetê baş dizanin. Jinên ku laşê wan bi awayekî tazî hatin teşhîrkirin, jinên ku di binçavan de hatin tacîzkirin û tezawizkirin, jinên ku ji ber şerî hatin koşberkirin, jinên ku li ser dîwarên odayên wan ên razanê nivîsên bêehlaq hatin nivîsin, jinên ku di avahiyên partiyê de hatin qetlêkirin, jinên ku mecbûrî xwekuştinê hatin hiştin... Ev rastî bi tenê ne ji ber serdestiya mêran e, ev rastî ji ber polîtîkayên fethkirinê jî derketiye holê. Wek jinên Kurd me do çawa li dijî van polîtîkayan serî hildabe û me baweriya xwe bi wekheviya jin û mêran anîbe, ji îro pê ve jî em ê dev ji têkoşîna azadiya jinan bernedin û em ê li dijî van êrişan li her qada jiyane parastina xwe xurt bikin û em ê têkoşîna xwe bidomînin.



Jin

Jiyan

Azadî



**RAPORA TESBÎTA REWŞA
TUNDIYA LI JINAN A MÊR/DEWLETÊ
YA LI KURDISTANÊ**

SAL 2021 (ÇILE-ÎLON)

